Dibustanan de bi cudan ve têtin biderkevtin; jiber ku li nik her yekekî jî de rengê taybetîyî rastîya bi carekê ve, bihişbûn û dadwerî careke din di rêya têgihîştina weyî xweyî de, di rêya mercên jîyana wî de û di rêya pîvanên wîyî zanebûnê de û şeweyê remankirina wî de têtin bimerckirin, weha di vê pevçûna hanê de rastîyên bi carekê ve tu çarekirineke din nadin bidan, ji bil yên ku ew xwe bi xwe ve bi hev re didin bigirêdan. Jibervêjî ve tiştekî din jî nikarîbû bihata biderkevtin, ji bil rengê ji sosyalîstîya bi bê bîr û bawerî ve bête biderkevtin, ya ku ew bi rastî ve tanî îrojî di nava serên piranîya Kargerên sosyalîstîyî de li Firensa û Ingilistanê de tête bizalkirin. Ev rengê sosyalîstîya bi bê bîr û bawerî ve ji lênerîna tevlihevî rexneyî sivik de, ji bîr û bawerîyên abûrî û ji lênerînên ayinde de ji bona civakê de ji bal Xwedîyên rêçên cudan de tête biderkevtin, ew tevlihevbûnekê dide biderxistin, ku ew bi hêsanî ve ji hev tête bivekirin û bi tyabetî ve perçên wê zû ji hevdû di peyvê de û di lêkolandinê de têtin bikevtin û kenarên wêyî tûj nala bixuran di cihokê de têtin bikokirin. Da ku ji vê sosyalîstîya hanê zanistîyek bête bidurustkirin, divabû ku ew di pêşî de li ser zemîneke rast û dirust de bête bidanîn.

-II-

Di vê navbera hanê de li tenîşt û piştî felsefa Firensîyê sedsalên heştdehan de felsefa Elmanîyê nuh hate peydakirin û wê xwe ligel Hegel de date bitacûxelatkirin. Mezintirîn pêrabûna di wir de dihate biderkevtin, ku wê ji xwe re careke din diyalêktîk bi nala berztirîn rengê remankirînê ve date biwergirtin. Feylesufên kevnî Yunanî tevde di zikmakîya xwe de bi nala Diyalêktîkvanan ve hatibûn û serê Zanîstvanîrîn di hemû berên zanîstîyê de di nava wan de bi Aristo ve dihate biderkevtin, yê ku wî di wê demê jî de li rengên giringtirîn ji remankirina diyalêktîkî de date bilêkolandin. Felsefa nuh bi servajî ve, tevî ku di wê jî de ji bona Diyalêktîk Wênerên wêyî bi nav û bang ve (ji bona nimûne Descartes û Spinoza) dihatin biderkevtin, bi taybetî ve di bin kêrkirina felsefa Ingilîzî de hin bi hin ve dihate bikevtin, ya ku jê re şeweyê remankirina Mêtafîzîkî tête bigotin, ya ku ew him ji bal Feylesufên Ingilîzî û herweh jî him jî ji bal Feylesufên Firensîyên sedsalên heştdehan de û bi kêmanî ve di kar û barên wanî felsefî de pê dihate bigirtin û ew ji bal wê de bigir bi carekê ve dihatin bizalkirin. Lêbelê jî ji derveyê felsefa xwe jî de ew bi karî ve dihatin biderkevtin, ku ew karên diyalêktîkîyî pir giran û mezin bidin bidurustkirin; em bes û bi tenha ve li ser "Rameaus Neffen" -Birazyê Ramo- ji bal Diderot de û "Abhandlung über den Ursprung der Ungleichheit unter den Menschen" -Lêvenerîna li ser koka newekhevyî de di nava Merovan de- ji bal Rousscau de didin bibîrxistin. Emê dê li vêderê de bi

kurtî ve navka herdu rêyên remankirinê bidin biderxistin.

Gava ku em serûştîyê yanjî mejûwa Merovanîyê yanjî jêhatîbûna remankirina xwe ji bona jêr çavdêrîya remankirinê bidin biavêtin, weha di pêşî de ji me re wêneyekî tevlihevî bi bê dawîyên gihandin û pêwendîya ve tête bihatin û biçûyîn. Em di pêşî de wêne ji xwe re didin bidîtin, yê ku jê tiştêk nema tête bimayîn, çi bû, li kuderê bû û cawan bû; lêbelê hemû xwe dide bilivandin, xwe dide biveguhertin, xwe di bûn û di nemanê de dide bidîtin. Weha em di pêşî de ji xwe re tevaya wêne didin bidîtin, ku têde hêjî yeka yekan xwe bêtir yanjî kêmtir ber bi paş ve didin bivekişandin, em bêtir bala xwe bi livandinê ve, bi veguhertinê ve û bi pêwendîyên ligel hevdû de didin bidan, em bala xwe li ser wî tiştî de didin bigirêdan, çi xwe dide bilivandin, çi xwe dide biveguhertin û çi xwe ligel hevdû de dide bipêwendîkirin. Ev lênerîna kokîyî xav ji bona çîhanê, lêbelê ya ku ew di bingehe xwe de bi rast ve tête biderkevtin, bi rêya felsefa Yunanîyî kevin ve dihate biderkevtin û ew di pêşî de bi eşkere ve ji bal Heraklit de hate bigotin: her tişt heye û niye jî; jiber ku hemû tête biherikandin, ew her û her xwe di veguhertinê de, xwe di bûyîn û nemanê de dide bidîtin. Lêbelê ev lênerîna hanê jî, çendjî ku ew wehajî bi tevayî ve biçmê tevaya wênê diyaran bide biderxistin, hêjî nayête bitêrkirin, ku ew yên yekanan bi dûr û dirêjî ve bide bixuyanîkirin, ji yên ku ji wan tevaya wênê xwe dide bisuwarkirin û weha tanî ku em van dûr û dirêjîyan nedin binaskirin, weha divê li ser me de, ku em ji-hevgirêdanên wanî serûştî yanjî mêjûyî de bidin biderxistin, her yekê bi tenha xwe ve li gora pêkhatinên wê de, li gora hoyên wêyî taybetî de û li gora kêrkirinan de ûhd. lêbidin bigerandin. Ev di pêşî de bi karê Zanistîya serûştîyê û lêgerandina mêjûwê ve tête biderkevtin. Berên lêgerandinê,

yên ku ew ji ber hoyên baş de li nik Yunanîyan de di dema kilasîkî de bes û bi tenha ve cihekî bi kêmîr ve ji xwe re didatin biwergirtin, jiber ku divabû li ser wan de di pêşî de metirya ji bona wêna ji vir û ji wir bi serhevdû ve bidin bikomkirin. Di piştî ku metiryalê serûştî û mêjûyî tanî pileyekî hate bicivandin, di wê çaxê de dikarîbû lêvenerandina rexnegîrî, beramberîhevkerin yanjî di parvekirina wan de ji bona desteyan, sazmendîyan û rengan bihata bideştêkirin. Destpêkên rast û durustîyî lêgerandinên serûştî jiberwêjî ve di pêşî de li nik Yunanîyên pêla Iskender de hatin biderkevtin û di pişt re di sedsalên navînî de ew ji bala Ereban de bi bêtir ve hatin bipêşvexistin⁴⁸, lêbelê zanîstîyêke serûştîyî bi rast û durustî ve di pêşî de di perçê duwemî nivê sedsalên 15 de tête bimêjûkirin û ji vir û pê ve wê xwe bi lezbûneke bêtir ve her û her gavên xwe ber bi pêş ve didate biavêtin. Parvekirina serûştîyê di nava perçên wêyî yeka yekan de, ji hevcihêkirina rûdanên di serûştîyê de û tiştên di serûştîyê de ji bona desteyên nîşankirî, lêgerandina ji bona nava laşê zindî li gora pêkhatinên wîyî zindîyî cuda ev tevde bi hev re bi mercê bingehî ve ji bona avêtina gavên gewreyî mezin di pêşkevîna de dihatin biderkevtin, yên ku di rêya wan de di çarsed salên çûyî de zanebûna li ser serûştîyê de ji me re datin bianîn. Lêbelêjî herwehajî pêrejî vê rêya lêgerandina hanê ji me re bi xwe re jî reweştekan li dû

⁴⁸Alexandrinische Periode - die Zeit der Ptolemäer (323-30 v.Z.) - dema Iskenderîyê û Serdarîkirina Romanan tanî Hêrîşa Ereban ji (30 b. Z. tanî 64o Z.) di bajarê bendera Misrêyî Iskenderîyê de tête biderkevtin, ya ku ew di wê demê de bi navîya Zanîstî û zanyariyê ve dihat biderkevtin. Di vê pêla Iskenderîyê de rêzekê ji Zanîstvanan ji Jimargeran mîna (Euklid û Archimedes) hatin biderkevtin û herwehajî tête giyografî, Stêrnasî, Anatomî, Physiologie ûhd hatin bigeşkirin.

xwe de date bihiştin, ku em li ber tiştên di serûştîyê de û rûdanên di serûştîyê de di tekbûna wan de ji derveyî tevaya pêwendîyên ligel hevdûyî mezin de bêtin biliberkevtin; jibervêjî ve ne di livandinê de, lêbelê di rawstandinê de, ne mîna di cewherê de bi veguherî ve, lêbelê mîna di pêkhatinên xwe de di rawestyayî de, ne di jîyana wê de, lêbelê di mirina wê de dihatin biliberkevtin. Gava ku wê lênerîna zanistîya serûştîyê xwe ji bona felsefê date biveguhestin, mîna ku ev di rêya Bacon û Locke de hate bikirin, wê kurtbûna berê dîtîne date bivejandin, ya pê sedsalên navînî dane binaskirin ku ew jî di şeweyê remankirina Mêtafîzîkî de tete biderkevtin.

Ji bona Mêtafîzîkvanan tişt û mirêkkirina wêneyên wan, têngihiştin, tekane, yek li dû ya din û bi bê li ya din de bête bimeyze kirin, hîmkirî, rawestyayî, tiştê ku ew her û her ji bona lêgerandinê hatîye bidayîn. Ew di dijbûnên bi serê xwe didin biremankirin; peyva wîna bi erê ve, erê, bi na ve na tete biderkevtin; çî di ser re bête biderkevtin, ew jî bi bed ve tete biderkevtin. Ji bona wî tişt heye, yaxud ew niye: Tiştêk nikare di yek demê de bi xwe ve bête biderkevtin û ew bi xwe ve bi tiştêkî din ve bête biderkevtin. Baş û nebaş hevdû bi carekê ve didin binayînîkirin; wetovjî hoy û kirdar bi bê livandin ve bi dijî hevdû ve têtin birawestandin. Ev şeweyê remankirinê ji bona me di awira pêşî de jibervêyekê ve pir bi ronahî ve tete biderkevtin, jiber ku ew bi rêyekê ve li gora hişê saxî Merovan de tete biderkevtin. Lêbelê ev hişê saxî Merovan weha bi hêja û buha ve tete biderkevtin, tanî ku ew xwe di nava çar dîwarên xwe de dide bidîtin, lêbelê ew ji xwe re serpehatîyên sersûrayî bi çavên xwe ve dide bidîtin, gava ku ew wê mêranîyê di xwe de dide bidîtin û ew xwe ji bona nava cîhana firehî lêgerandinê dide biavêtin. Şeweyê lênerîna mêtafîzîkî di dûrbûneke wisa de li gora

serûştîya tiştên di nava lepan de weha bi berên xweyî fireh ve dibe ku ew bi rastî ve û hêjbêtir bi neçarî ve bête biderkevtin, lêbelê hercar bi zû ve yanjî bi derengî ve ew li bin guhê bergirekî ve têtê bikevtin, jiber ku ew bi yekalî ve, bi kurtbînî ve û bi serê xwe ve têtê biderkevtin û xwe di nava dijbûnên neçarekirî ve dide biwindakirin, jiber ku ew tiştên tekane di pêwendîyên wanî bi hev re, li ser hebûna wan de di bûyînê û nemanê de, li ser aramîya wan de û li ser livandina wan de dide bijibîrakirin, jiber ku ew ji pîrbûna daran daristanê nade bidîtin. Di jîna rojê de ji bona nimûne em dizanin û em dikarin bi rast û durustî ve bidin bigotin, magelo cenawerek heye yanjî niye; lêbelê ligel lêvenerîneke bi rast û durust ve em ji xwe re didin bidîtin, ku ev car caran bi tişteki pir tevlihevî dujwar ve têtê biderkevtin, mîna ku Dadyar zor baş dizanin, ku hemû pêrabûnên wan ji bona dozandina sînorekî ji hiş tevde bi xurayî ve hatin biderkevtin, gava ku wan li pîrsa kuştina Zarokekî de di zikmakîyê de didatin biaxivtin, magelo kuştina Zarok di zikmakîya Dêya wî de bi kuştinê ve têtê biderkevtin? herwehaji ma kengî rast û durust ew kuştina hanê hatîye bikirin? Jiber ku zanîstîya jîndarîyê daye bieşkerekirin, ku mirin ne bi yek carê ve, ne bi rûdaneke awirî ve, lêbelê ew bi kirineke pir dirêjî tevlihev ve têtê biderkevtin. Herwehaji her jîndarekî zindî di her awirekê de ew bi xwe ve u ew ne bi xwe ve têtê biderkevtin, di her awirekê de ew li ser tiştên ji derve jêre hatî de dide bikarin û herwehaji ew yên din dide biderkirin, di her awirekê de şanên laşê wî têtin bimirandin û yên nuh xwe didin avakirin; li gora demeke dirêj yanjî kurt de tiştê wî laşê hanê xwe bi carekê ve dide binuhkirin û ew xwe di rêya perçên tişteki din de dide biveguhertin. Wehaji em li nik lênerîneke rast û dursut de didin bidîtin, ku herdu serên dijbûneke, wek Posetiv -Başî- û Negativ -Nebaşî-

wehajî ew ji hev nayêtin biparvekirin mîna ku ew bi dijî hev jî ve têtin biderkevtin, tevî li hemû dijbûnên wan jî de ew xwe bi xwe ve hevdû didin bigirtin, herwehajî pêrejî hoy û kirdar bi remanên serên Merov ve têtin biderkevtin, yên ku ew bes û bi tenha ve bikaranîna xwe li ser bi rûdanekê ve bi tenha xwe ve bi weha ve dikarin bi rast ve bêtin biderkevtin. Lêbelê gava ku em ji xwe re li vê rudana bi tenha xwe ve di tevaya pêwendîyên wê de ligel tevaya dûnyayê de bidin bitemaşekirin, bê çawan ew ligel hevdû têtin biçûyîn û bê çawan jî ew xwe ji hevdû di dîtineke giştîyî hevkerkirinê de didin bixistin, ku her û her hoy û kirdar cihên xwe bi hevdû re didin biveguhertin, yê ku niha ew bi hoy ve anjî bi kêrdare ve li vir de dihate biderkevtin, li wêderê de yanjî di pişt re bi hoy ve û bi servajîvêjî ve dê bête biderkevtin.

Ev kirinên hanê û rêyên remankirinê nema dikarin xwe ji bona nava perwazên remankirinên mêtafizîkî bidin bilihevkerin. Ji bona diyalêktîk bi servajîvêjî ve, ya ku wê tişt û wênekirinên wanî liberkevtinê di bingehî de di pêwendîyên wanî bi hev re, di girêdanên de, di livandinên wan de, di peydabûn û nemana wan de dihate biliberkevtin, kirin bi mîna yên gotîyî li jor de di rêya xweyî taybetîyî lêgerandinê de têtin bicîhatin. Serûştî xwe bi cihê ceribandîyê ve li ser diyalêktîkê de dide biderxistin û divê li ser me de li dû zanistîyên serûştîyî nuh de bidin, ku ew ji bona vê ceribandîna hanê tişt û miştên pir dewlemend û xwe ji bona her roj komkirî didin bipêşkeşkirin û pê ew didin bieşkerekirin, ku di serûştîyê de û di dawîya dawî jî de bi diyalêktîkî ve û ne bi Mêtafizîkî ve têtê bikirin, ku serûştî xwe ne her û her di gurovereke tekane de bi serê xwe ve têtê bigerandin û ew her û her jî têtê têtê bivegerandin, lêbelê ew di mêjûweke rastî de têtê biderbaskirin. Li wêderê de di berî her kesî de Darwin têtê binavkerin, yê ku wî ji bona

91 Pêşkevîna Sosyalistîyê ji Otopîyê tanî Zanistîyê

liberkevîna serûştîyî mêtafîzîkî lukmeke pir xurt di rêya eşkerebûna xwe de lê date bixistin, ku tevaya serûştîya zindîyî îro, şînayî û cenawer û pêrejî Merov bi berkirina pêşkevîneke kirinê ve li

dû hev de ji milyona sal têtê biderkevîtin. lêbelê jiber ku Lêgervanên serûştîyê tanî niha bi kêm ve têtin biderkevîtin, yên ku ew bi remankirina diyalektîkî ve hatine bifêrkirin; jîbervêjî ve têtê bixuyanîkirin, ku ji vê pevçûna encamên dozandî di rêya şêweyê remankirina berê de sînoren bi bê dawî ve ji tevlihevbûnê têtin biderkevîtin, yên ku ew niha di dîtînen zanistîyên serûştîyê têtin bizalkirin û yên ku ew Mamoste û Şagirt, Nivîsakar û Xwendevan bi bê hêvîbûn ve didin bigihandin.

Daxuyanîyek rast û durust ji bona tevaya dunyayê, ji bona pêşkevîna wêna û Merovan û herwehaji mirêkkirina wêneyê vê pêşkevîna hanê di nava serên Merovan de weha bes û bi tenha ve dikare di rêyên diyalektîkî de, bi lênerîneke hergavî ve ji bona pêwendîyên giştîyî ligel hevdû de di bûyîne û nemanê de, di veguhertînen pêşkevîne de yanji veguhertîne paşvekevîne de bête bipeydakirin. Bi vê têgihîştina hanê jî ve felsefa Elmanîyî nuh xweser xwe date biderxistin. Kant dest bi dest ve bi jêhatîbûna jîna xweyî zanistîyê ve pê date bidestpêkirin, ku wî sustêma rojêyî Newtonî di cihê xwe de û her û her mayî -piştî palpêda pêşî, ya ku jêre têtê bigotin- di rûdaneke mêjûyî ji hev date biderxistin: ji bona peydabûna Rojê û hemû Sitêran ji komeke mijêyî gerandî. Jivêjî ve wî pêrejî encam ji xwe re date biwergirtin, ku ligel vê peydabûna hanê jî de pêrejî windabûna ayindeyî sustêma rojê jî bi neçarî ve hatîye bidan. Bîr û bawerîya wîna piştî derbasbûna nîvsedsalekî di rêya Laplace de bi jimargerî ve hate bibingehkirin û hêjî di piştî derbasbûna nîvsedsalekî din jî de Spektroskop hebûna

komên gasên gûrkiyî di wisa di asman de bi pileyên cudan ve di tîrbûna xwe de date bieşkerekirin.

Felsefa Elmanîyî nuh di sustêma Hegel de bi dawîya xwe hate bigihandin, ya ku têde di cara pêşî de -ev jî bi qencîya wîyî mezin ve tête biderkevtin- tevaya cîhana serûştî, mêtûyî û canî bi mîna kirinekê ve ango bi nala livandineke her û her ve, bi veguhertinê ve, di pêkhatin û pêşkevtinê de hate bixuyanîkirin û herwehaji têde pê hate birabûn, ku pêwendiyên hundurû di vê livandinê û pêşkevtinê de bêtin bieşkerekirin. Li gora vê dîtina hanê de mêtûwa Merovanîyê nema êtir bêtir bi nala tevlihevbûneke bi ser û ber ve ji karên zordariyê dihate bixuyanîkirin, ya ku ew li ber kursîya Dadvan de ji felsefa hişdariyî sitewyayî de hemû bi hev re têtin biavêtin, ya ku Merov wê bi lez û bez jî ve ji xwe re dide bijîbîrakirin, lêbelê wê bi nala kirinekê ve ji pêşkevtina Merovan bi xwe ve pê tête biliberkevtin, ya ku qonaxên çûna wêyî hêdî hêdî di nava hemû rêyên şaşbûnê de têtin biderkevtin û qanûnmendiyên wêyî hundurû di rêya hemû xuyanîyên lihefrasthatî de tanî radeyekî têtin bieşkerekirin. Ev hemû bi hev re niha bi karê Remangîran ve dihate biderkevtin.

Ku sustêma Hegels nikarîbû vî karê hanê bide biçarekirin, yê ku wê ew ji xwe re dabû bidanîn, li vê derê ew ji me re bi wekhev ve tête biderkevtin. Qencîya wîyî mezinî gewreyî dem pê nîşankirî di wir de dihate biderkevtin, ku wê ew pirsariyên hanê dane bikirin. Belê evaya bi karekî ve tête biderkevtin, ku hîç kesek bi tenha xwe ve carekê dê bikaribe bide biçarekirin. Tevîjî ku Hegel - ligel Saint-Simon de- bi serê zanistîrînî tevayîyî dema xwe jî ve dihate biderkevtin, belê wehaji ew bi sînorkirî ve dihate biderkevtin: 1. Ew di rêya neçarbûna sînorkirina firehbûna zanebûna xwe de dihate biderkevtin, 2. Herwehaji ew di

rêya sînorkirina mezinbûn û kûrbûna zanebûn û dîtînen pêla xwe de dihate biderkevtin. Lêbelê hêjbêtir xalekî sêyem jî hate bipêvekirin, ku Hegel bi Idealîst -Nîmûnevan- ve dihate biderkevtin, ango di dîtîna xwe de remanên di serê wî de ne bi nala kêma yanî bêtir ve bi mirêkkirina wêneyên rûtî bi serê xwe ve ji yêna tişt û rûdanên bi rastî ve dihatin biderkevtin; lêbelê ew bi servajî vê jî ve di dîtîna wî de tişt û pêşkevîna wan bes û bi tenha ve bi nala bicihanîna mirêkkirina wan ve di cihekî de dihate biderkevtin û "Reman" bi berî cîhanê ve dihatin bihebûn. Bi vê yekê ve hemû hatin biserûbinkirin û pêwendîyên rastîyî bi hev re di cîhanê de bi carekê ve hatin biwergêrkirin. Tevî weha rast, gewre û mezin ji têgihîştina Helgel ji bona hin pêwendîyên bi hev re ji yêna teka tekan jî de dihatin biderkevtin, wehajî divabû jiber hoyên gotî jî de di dirêjbûnên xwe de pir jê bi pînekirî ve, bi qelp, bi çêkirî ve û bi kurtî ve ew bi serberjêrî hev re dihate biderkevtin. Sustêma Hegel wek nala sustêmekê bi xwe ve ew bi gewretirîn û mezintirîn beravêtin ve dihate biderkevtin. - Lêbelê jî ew bi xwe jî ve bi ya dawî ve ji rengê xwe ve dihate biderkevtin-. Hêjbêtir ew bi xwe jî ve bi derdekî bê derman ve ji dijûnên di nav xwe de hatibû bikevtin: Ji alîyekî de li gora piranîya mercên bingeşîyî dîtîna vê sustêma hanê de ji bona mêjûwa Merovanîyê bi kirineke pêşkevî ve têtê biderkevtin, ya ku li gora serûştîya wêna de ew ne dirêya dozandinekê de, ya ku jêre rastîya bi serê xwe têtê bigotin, dikare bi dawîya xwe ve bête bigihandin; ji alîyê din de ev sustêma dide bigotin, ku ew xwe ber bi bûna vê rastîya bi carekê ve dide bikirin. Sustêmek, ya ku ew ji hemû alî de û ya ku ew bi sustêmeke dawî ve ji bona zanebûna serûştîyê û mêjûwê têtê biderkevtin, ew her û her bi dijî qanûnên bingeşîyî remana diyalêktîkî ve têtê biderkevtin; ev remana diyalêktîkî bi tucorî ve

nade binayînîkirin, lêbelê ew bi servajîvêjî ve dide bierêkirin, ku bi naskirineke rêk û pêkî ve ji bona tevaya cîhana derve bi Nifş bi Nifş ve dikare gavên gewreyî mezin ber bi pêşve bide biavêtin.

Liberkevtina di wergêrkirina bi carekê ve ji bona nimûnetîya Elmanîyî tanî niha de bi neçarî ve ji bona metiryalistîyê date bigihandin, lêbelêjî bi başî ve divê bête bigotin, ku ew ne bes tenê ji bona metiryalistîya mêtafizîkî û herwehajî ne jî bes tenê ji bona metiryalistîya mikanîkîyî sedsalê heştdehan hate bigihandin. Bi beramberî Şûreşa xavî kal ve, ya ku wê bi hêsanî û sivikbûn ve tevaya mêjûwa derbasbûyî ji xwe re didate bidîtin, metiryalistîya nuh di mêjûwê de kirina pêşkevtina Merovanîyê ji xwe re didate bidîtin û wê bi dozandina qanûnên livandî ve têde bi erkê xwe ve didate bidanîn. Beramberî Firensîyên sedsalê heştdehan û herwehajî hêjî li cem Hegel jî de di serên wan de dihate bikevtin, ku serûştî bi nala yekbûnekê ve xwe di nava çûna guroverên teng de dide bilivandin û ew her û her bi mîna xweyî tevayî ve ligel laşên cîhanê mayî de tête biderkevtin, mîna ku Newton wê dide bixuyanîkirin û ew bi rengên ne guhertî ve ji jîndarên zindî ve tête biderkevtin, mîna ku Linné ew ji Xwendevanan xwe re didate biderxistin. Bi beramber van bîr û bawerîyên hanê ve metiryalistîya nuh pêşkevtinên nuh di zanistîya serûştîyê bi serhev ve date biliberxistin, ku li gora wêna de serûştî bi xwe jî ve mêjûwa wê di demê de tête biderkevtin, laşên cîhanê û herwehajî rengên laşên zîndî, ji yê ku ew li jêr zînetên baş de têtin bidîtin, têtin bipeydakirin û têtin biçûyîn û Kreisläufe -çûnên guroverî-, mîna ku ew bi carekê ve dikarin bêtin bimayîn, bi bê qam û bi bê dawîbûn ve têtin bigewrekin. Di herdu caran de ew di cewhera xwe de bi diyalêktîkî ve tête biderkevtin û ew nema bêtir bi pêwisitî tu

95 Pêşkevîna Sosyalîstîyê ji Otopîyê tanî Zanîstîyê

felsefeyekê ve li ser zanîstîyên din de bi rakirîvê têtê biderkevtin. Çi gava ku ji bona her zanîstîyê hate bixwestin, ku ew li ser lênerîna xwe de di tevaya pêwendîyên bi hevreyî tiştan ve û di zanebûnê de ji bona tiştan bi eşkere ve bide bixuyanîkirin, di wê çaxê de weha her zanîstîyêke bi taybetî ve ji bona tevaya pêwendîya bi hev re bi bê kelk ve têtê biderkevtin. Çi ji tevaya felsefa çûyî de hêjî dikare bi serê xwe ve xwe bide bihiştin, jê rêya remankirinê û qanûnên wê die formelle Logik -Mentiqê bi navî ve- û Diyalêktîk dikarin bêtin bihiştin. Tevaya tiştên din ji bona nava zanîstîyên positîv -baş- di serûştîyê û mêjûwê de têtin biçûyîn.

Belê di wê çaxê de geşbûnê di lêgerandinên serûştîyê de bes û bi tenha ve bi wê pîvanê ve dikarîbû bihata bipêşveketin, mîna ku lêgerandinê zanebûnên bi başî ve dikarî bida bipêşkeşkirin. Pir ji mêj ve rastîyên mêjûyî xwe didane buxuyanîkirin, yên ku wan ji bona têgihîştina mêjûwê roleke pir giring û giran didatin bilîstin. Di sala 1831 de li Lyon de serhildana pêşîyî Kargeran date bidestpêkirin; ji sala 1838 tanî 1842 de tevgera Kargerên welatîyî pêşî Chartîstên Ingilîzî bi bilindtirîn sipanê xwe ve hatin bigihandin. Xebata çînî di navbera Pirolitarya û Borcuwazîyê de ji ser tirada pêşîyî mêjûwê di nava pêşkevîtîrîn welatên Ewropî de hate bidakevtin, li gora wê pîvanê ve bê çawan li wir de ji alîyekê de çekirina gewre xwe didate bipêşvexistin û ji alîyê din jî de bê çawan serdarîya siyasîyî Borcuwazî xwe didate bipêşvexistin. Fêrkinên abûrîya Borcuwazîya li ser bi yekbûna berjewendîyên sermîyan û kar ve, li ser lihevkerina giştî de û li ser xweşbûna jîna Gel bi tevayî ve bi nala encamê berberîya azad ve, ew hemû her û her bi xurtî ve ji bal rastîyan de bi derewan ve dihatin biderkevtin. Ev tiştên hanê

tevde nema dikarîbûn bêtir bihatana biavêtin, herwehajî pêrejî sosyalistîya Firensî û Ingilîzî jî ligel dîtinên wan jî de tevî li hemû kur û kêmanîyên wan jî de nema dikarîbûn di ser guhan re bihatana biavêtin. Lêbelê têgihîştin nimûneyî kevnî mêtîyî, ya ku ew hêj ji cihê wê nehatibû bilivandin, tu xebata çînîyî li ser bingegehên berjewendîyên madî de, neji bi carekê ve li ser tu berjewendîyên madî de didate binaskirin, berkirin û herwehajî pêrejî hemû pêwendîyên abûrî têde bes û bi tenha ve weha di tenîstê re bi mîna ne perçeyên giring ve ji "Kulturgeschichte" -Mêtîyîwa Çandî-nîyê- dihatin biderbasbûn.

Rastîyên nuh pê datin bineçarîkirin, ku tevaya mêtîyîwa çûyî ji bona jêr ligerandineke nuh divê bête biavêtin û di wir de hate bixuyanîkirin, ku tevaya mêtîyîwa çûyî ji bil Urzustand -zînetî kokî- de hemû bi mêtîyîwa xebata çînîyan ve di hate biderkevîtin, ku van Çînîyên civakî ligel hevdu de xebat didatin bixebatkirin û her û her bi durustkirinên pêwendîyên berkirinê û bi hevguhertinê ve dihatin biderkevîtin, bi kurtî ve ew bi durustkirinên pêwendîyên abûrîyî dema xwe ve dihatin biderkevîtin; weha di her carekê de suwarkirina abûrîyî civakî bingegehê rastî dide biavakirin, ji vî bengehê hanê rastî tevaya avanîya jorî de avanîyên mafebûnê û siyasî û herwehajî ayînî, felsefî û pêwendîyên din jî di her pêleke mêtîyî nîşankirî de di dawîya dawî de bi pê ve têtin bixuyanîkirin. Hegel têgihîştina mêtîyîwê ji mêtîfîzîk date birizgarîkirin, wî ew bi diyalêktîkî ve date bikirin, - lêbelê têgihîştina wîna ji bona mêtîyîwê di cewhera xwe de bi idealîst -numûnetî- ve di hate biderkevîtin. Niha Idealîsmus -nimûnetî- ji cihê penabûna xweyî dawî ji têgihîştina mêtîyîwê hate biderkirin û ji bona mêtîyîwê têgihîştineke metîryalistî hate bipêdan û rê hate bidîtin, da ku şiyarbûna Merovan ji hebûna wan û ne mîna tanî niha

hebûna wan ji şiyarbûna wan bête biliberxistin.

Li vê gorê de niha sosyalîstî nema êtir bêtir bi nala dozandineke lihevraştatî ve ji bona serê vî Hozanî yanjî yê din dihate biderkevtin; lêbelê ew bi nala durustkirineke neçarîyî xebatê ve di navbera du çînîyên mêjûyîyî peydakirî de, di navbera Pirolitarya û Borcuwazîyê de dihate biderkevtin. Karê li ser wê de nema êtir bêtir di peydakirina deha baştirîn rêstika civakê de dihate biderkevtin, lêbelê karê wê di lêgerandina bi rê ve çûna abûrîyî mêjûyî de dihate biderkevtin, ji ya ku jê ev çînîyên hanê û pevçûnên wan ligel hevdu de bi neçarî ve dihate biderkevtin û pêrejî tede divabû di rêya zîneta civakî û abûrî dirustkirî de çarên çarekirina pevçûnê bihatana bidozandin. Lêbelê ligel vê têgihîştina metiryalî de ne sosyalîstîya tanî niha û ne jî têgihîştina serûştîyî metiryalistîyê Firensînî jî ligel diyalêktîkê û zanîstîya serûştîyî nuh de dikarîbû bida biliberxistin. Sosyalîstîya tanî niha belê bi rastî ve li şeweyê berkirina sermîyandarîyî heyî de û li encamên wêyê lidûhatî de didate birexnekirin, lêbelê wê nikarîbû ew bidana biliberxistin, wehajî pêrejî wê ligel wan de nikarîbû zora wan bida bibirin; lêbelê wê bes û bi tenhave dikarîbû bi hêsanî ve wan bi pîşî ve bide bixuyanîkirin. Çiqasî wê bi xurtî û jêhatî ve dijî vê çewisandina çînîya Kargeran, ya ku ew ji vî şeweyê berkirina sermîyandarîyê nayête bicudakirin, didate bixebatkirin, hêjî deha bi kêmtir ve wê xwe didate bidîtin, ku ew bi eşkere ve divê bide bigotin, ku bê kanî di kû de ev çewisandina hanê tete bipeydakirin û çilo jî ew tete bipeydakirin? Pirsê xwe li ser vê de didate bikin, ku ji alîkî de şeweyê berkirina sermîyandarî di nava pêwendîyên wêyî mêjûyî de û divabûna derkevîna wêna di qonaxeke mêjûyîyî nîşankirî de, belê herwehajî divabû bi neçarî jî ve wibdabûna wêna bihatina bixuyanîkirin,

herwehajî ji alîyê din jî de divabû rûçikên wêyî hundurû jî bi eşkere ve bihatana bixuyanîkirin, ji yê ku ew hêjî her û her bi veşartî ve hatibûn bimayîn. Ev jî di rêya eşkerekirina Hêjabûna Bêtir ve hate bikirin. Vê date bieşkerekirin, ku sitendina karê bi bê kirê ve bi rengê bingehîyî şeweyê berkirina sermîyandarîyê ve têtê biderkevtin û çewisandina Kargeran di rêya wê de têtê têtê biderkevtin; hegerjî ku Sermîyandar bi xwe jî ve hêza karê Kargerên xwe li gora hêjabûna wêna de bi carekê ve ji xwe re bide bikirîn, mîna ku ew bi nala malekî ve xwe di nava bazarê de dide bidîtin, tevlivêjî de ew jê ji bona xwe hêjabûn Bêtir dide biwergirtin, ji mîna buhayê ku wî ew ji bona kirîna wê dabû bidan û ku ev Hêjabûna Bêtir di dawîya dawî de tevaya hêjabûnê dide bipêkanîn, ya ku jê her û her gewrebûna koma sermiyan di nava destên çînîyên Maldar de têtê bipikirin. Weha bi vî rengê hanê ve çilobûna berkirina sermîyadarîyê û herwehajî pêrejî berkirina sermiyan jî hate binaskirin.

Ev herdu dozandinên mezin: têgihîştina metiryalistîyî mêtîyî û eşkerekirina veşartina berkirina sermîyandarîyê di rêya Hêjabûna Bêtir de em pê ji bona Marx didin bisipaskirin. Ligel wan de sosyalistî bi zanistbûnekê ve hate biderkevtin, ya ku ew xwe pê di pêşê de pêre dide bimijulkirin, ku ew wê di tevaya tekanên wê de û di tevaya pêwendîyên wê de bêtir li ser wê de bide bikarkirin.

-III-

Têgihîştina metiryalîstîya mêjûyî ji vê hevokê tête biderkevtin, ku berkirina durustkirinan di pêşî de û di pişt re bi hev re veguhertina wan ligel hevdû de bingehê her rêk û pêkxistinek civakî dide pêkanîn; ku di her civakeke mêjûyî de xwe diyarkirî parvekirina berkirinan û pêrejî parvekirina civakê di çînîyan de yanî di birran de li wê gorê de berê xwe dide bikirin, çî û çawan tête biberkirin û çilo dê berkirin bête biveguhertin. Li gora vê yekê de divê li hoyên dawî de ji bona hemû veguhertinên civakî û wergêrkirinên siyasî ne di nava serên Merovan de û ne jî di liberkevîna wanî bêtir de ji bona rastîya hergavî û dadwerîyê; lêbelê di guhertinên şêweyê berkirin û şêweyê veguhertinê de li wan de bêtin bilêgerandin û ne li wan de di felsefê de, lêbelê di abûrîya wê demê de divê li wan de bête bilêgerandin.

Heger ku Merov hate biliberkevtin, ku avanîyên civakîyî heyî ne li ser bingehê hiş û dadwerîyê de hatine biavakirin, ku bihişbûn bi hîç ve tête biderkevtin û xweşî bi derd ve tête biderkevtin, ev bes û bi tenha ve dide binîşankirin, ku di rêya berkirinê de û şêweyên bi hev veguhertinê ve bi bê dengîyeke ker û lal ve guhertin dihatin bikirin, ku li ser wan de nema rêkûpêkxistên civakî dihatin bisuwarkirin, yên ku ew li gora mercên abûrîyî kevnî berê hatibûn bibirîn. Wetov pêrejê xweser hate bigotin, ku divê çarên ji bona avêtina dozandinên zînetên bed herwehaji di veguhertinên pêwendîyên berkirinê heyî de bi xwe ve bête

dîtin, -yên ku ew bi kêmtir ve yanjî bi bêtir ve hate bipêşkevtin-. Ev çarên hanê ne belkî ji nava serî de divên bêtin bivejandin, lêbelê divên ew di rêya serî de ji nava rastîyên matiryalên di nava destan de ji berkirinê bêtin bidozandin.

Çawan di niha de li vê gorê de sosyalistîya nuh tête biderkevtin?

Rêstika civakîyî niha, -ev bigir niha bi giştî ve pê tête birûniştin-, ew ji bal çînîya serdarî niha de, ji bal borcuwazîyê de hatîye biafirandin. Şeweyê berkirina taybetîyî Borcuwazîyê, ya ku ew ji dema Marx de bi navê Şeweyê berkirina sermîyandarî ve hatîye binîşankirin, ligel biserhevrebûnên cih û Birrên civakî de herwehaji ligel pêwendîyên xweyîyî ligel hev de di rêstika Derebegiyê de nikare bide bilihevkin; Borcuwazîyê rêstika Derebegiyê date biherifandin û li ser kavên wê de destûra civaka Borcuwazî date bidirustkirin, belê wê dewleta dunyayê di berberîya azad de, wê çûn û hatina azad, wê wekhevûn di navber Xwedîyên mal de, belê wê hemû xweşîyên dinî Borcuwazîyî bi navkirî ve dane biafirandin. Şeweyê berkirina sermîyandarîyê dikare xwe di niha de bi azadî ve bide bigeşkirin. Pêwendîyên berkirinêyî⁴⁹ amadekirî li jêr rêberîya Borcuwazîyê de xwe dane bipêşvexistin, ji pêla keldûmanê û aletên mîkanîkî de Manufaktur -kargehên-kevin ji bona çêkirinên gewreyî mazin hatin biveguhertin, ev veguhertinên hanê bi lezbûneke bê dawî ve û bi pîvanekeke tanî niha ve bi bê sînor ve dihatin bipêşvekevtin. Lêbelê jî mîna kargehan di dema xwe de û di bin kêra wan de

⁴⁹Di "Anti-Dühring de": bi Produktivkräfte -hêzên berkirinê- ve hatîye binivîsandin.

destkarîya pêşkevîna ligel bendên derebegîyî de di Zünft - Rêstika Destkaran- de bi pevçûn ve hatin bikevtin, wehî çêkirina mezinê gewre ji alîyê xwe jî de di tevaya pêkhatina xwe de di pêşkevîna de ligel wan bergiran de bi pevçûn ve hate bikevtin, ji yê ku ew pê ji bal şeweyê berkirina sermîyandarîyê de dihate bitengavkirin. Hêzên berkirina nuh niha ji rengê bikaranîna wan ji bal Borcuwazîyê de bi gelekî ve ji bikaranîna xwe di serên Borcuwazîyê de bi mezintir ve têtin biderkevtin û ev pevçûna hanê di navbera hêzên berkirinê û şeweyê berkirinê de ne bi nala pevçûnekê ve tete biderkevtin, ya ku ew di nava serên Merovan de hatîye bidustkirin, ku ew mîna pevçûnê di navbera gunehkarîya Merovan ji kokê de ligel dadwerîya Xwedawend de tete biderkevtin, lêbelê ew pevçûna hanê di rastîyan de, bi serê xwe ve, derveyî me, negirêdayî bi dilxwazîya me ve yanî bi vîna wan kesan re, yê ku wan ew dabûn bipeydakirin, tete bidîtin. Sosyalîstîya nuh bes û bi tenê ve bi nala vegerandina remanên vê pevçûna rastîyî hanê ve û wênekirina remana wêna di nava serên cînîya pêşî de tete biderkevtin, ya ku ew xweser li jêr wê pevçûnê de derdan ji xwe re dide bikişandin û ev jî bi cînîya Kerger ve tete biderkevtin.

Ji çî ev pevçûna hanê tete bipêkhatin?

Di berî berkirina sermîyandarîyê de, belê di dema sedsalên navî de berkirina biçûk bi giştî ve li ser bingehê Xwedîbûna bi taybetîyî Kargeran de ji bona çarên berkirina xwe dihate biderkevtin. Zevî ji bona Cotkarên biçûk, azad û yanî ji bona Peyan dihatin biderkevtin û destkarî di nava bajaran de dihate biderkevtin. Çarên -çandiyê, cihê kar, amrên karkirinê- bi çarên karî maldarîya yeke yakan ve dihatin biderkevtin, ew bes û bi tenha ve ew ji bona bi karanîna tekane ve hatibûn bi çêkirin, weha bi neçarî ve bi

pir biçûk ve, bi nala lepekî ve û bi sînorkirî ve dihatin biderkevtin û jibervêjî ve di rêzanê de ew bi xwe ve bi malê Berkivanan ve dihatin biderkevtin. Da ku van çarên berkirinêyî perçekirî û biçûk bi serhevdû ve bidin bikomkirin û bi mezinkirin, da ku wan ji bona bilindkirina berkirinêyî bi kêr û xurt ve di dema niha de bidin biveguhertin, ev bi xwe jî ve bi rola mêjûyîyî şeweyê berkirina sermînyandarîyê ve û hilgirvanê wêyî Borcuwazî de dihate biderkevtin. Mîna ku Borcuwazî bi vî karê hanê ve ji sedsalên panzdehan di sê koçan de pê hate birabûn: Hevkarîya hêsanîyî bi hev re, Manufaktur -Kargehî û Çêkirina mezin di mêjûwê bi wan ve hate bipêrabûn, Marx di derîyê çarem de ji "Sermîyan" bi dûr û dirêjî li ser de date biaxivtin. Lêbelê Borcuwazîyê li wir jî de, weha Marx date bieşkerekirin, nikarîbû wan çarên berkirinêyî sînorkî ji bona hêzên berkirinêyî gewre bide biveguhertin, bê ku ew wan ji çarên berkirinêyî ji maldarîya teka tekan ji bona çarên berkirinên civakî bide biveguhertin, yê ku ew bes û bi tenha ve ji bal tevayekê ji Merovan dikarin bêtin bikaranîn. Li şûna dolaba hûnandinê de, kursîya destîyî tevnê de, çakûçê Hesinger de ji bona ser tiradê mekîna hûnandinê, mekîna kursîya tevnê û çakûçê keldûmanê hatin bidekevtin; ji dêlva kargehên biçûkî teka tekan ve Fabrik -Kargeh- hatin biderkevtin, yê ku di nava wan de karên bi hev re ji bona sedan û bi hezaran ve dihatin bidivakirin. Mîna ku çarên berkirinê hatin biveguhertin, wetovjî berkirinên bi xwe jî ve xwe ji rêzekê ji pêrabûnên teka tekan de bi rêzeke ji pêrabûna civakî date biveguhertin û berkirinên ji berkirinên teka tekan ve ji bona berkirinên civakî hatin biveguhertin. Ta, cil û caw, malên hesinî, yê ku ew niha ji kargehê dihatin bihatin, ew bi berkirina hevreyî pir Kargeran ve dihate biderkevtin, ya ku ew di nava destên wan re li gora

rêzê de divabû bihata biderbasbûn, berî ku ew bihata bidawîkirin. Nema tu kesî ji wan dikarîbû bida bigotin: Min ev daye bikirin, evya bi berkirina min ve tête biderkevtin.

Lêbelê di gava ku ji ber xwe, bi bê danîn ve û bi hêdî hêdî ve pêkhatina parvekirina karê di nava civakê de bi rengê bingehîyî berkirinê ve hate bikirin, di wê çaxê de vê parvekirina kar ji bona berkirinan rengê Ware -mal- pê date bixistin, ku guhertin û veguhertina wan bi hev re, kirin û firotina wan ji bona Berkirvanên teka tekan date bikirin, ku ew pê niyazmendîyên xweyî pir bidin bitêrkirin. Weha ev jî di sedalên navînî de dihate bikirin. Ji bona nimûne Cotkar berkirinên çandinîyê ji bona Destkar ji xwe re didate bifirotin û wî ji xwe re ji wî durustkirinên destkarîyê didate bikirin. Di nava vê civaka hanê de ji Durustvanên teka tekan de û maldurustvanan de şeweyê berkirina nuh xwe ji bona nava wêna de didate birakişandin. Di nava vê parvekirina karê ji ber xwe ve bi bêdanîn ve, mîna ku wetov di tevaya civakê de dihate bizalkirin, wê parvekirina karê danînî bi bernamekirî ve date bidatin, mîna ku wê parvekirina kar di nava Fabrik -kargehên- tekane de dabû birêxistin; li tenîştê berkirina tekane de berkirina civakî dihate biderkevtin. Berkirinên van herdu alîyan li ser yek bazarê de bi xwe ve dihatin bifirotin, weha tanî radeyekî ew bi buhayê wekhev ve dihatin bifirotin. Lêbelê birêxistina bernamekirî ji parvekirina kar bi gelekî xurttir ve ji parvekirina karê ji ber xwe ve dihate biderkevtin; Fabrikên -Kargehên, ku wan li ser karkirina civakî de didatin bikarkirin, wan durustkirinên xwe bi arzantir ve ji durustkirvanên Biçûk didatin biçêkirin. Berkirvanên tekane ber bi ber ve jê dihatin bipengizandin û berkirina civakî tevaya sêweyê berkirinê didate bişûreşgêrîkirin. Lêbelê ev rûçikê wêyî şûreşgêrî weha bi kêm ve dihate binaskirin, ku ew bi servajîya xwe ve bi nala

çareyekî ve ji bona bilindkirin û ji bona pêşvexistina Warenproduktion -berkirina mal- hate bikaranîn. Ew xweser ji pêgirêdanê ve ligel bilindkirinên nîşankirîyî ji berê hayî de ji malkirinê û ji mal bihevguhertinê hate biderkevtin; ew ji sermîyadarê bazirganîyê, ji destkarîyê û ji kirya kar hate biderkevtin. Jiber ku ew bi xwe jî ve bi nala rengêkî nuhî berkirina mal ve dihate biderkevtin, jibervêjî ve Aneignungsformen -rengên sitendina berkirinê wehajî ji bona wêna bi carekê ve bi mîna xwe jê re hatin bimayîn.

Di berkirina mal de, wek ku wê xwe di sedsalên navîn de date bipêşvexistin, pirs bi carekê ve nikarîbû bihata bipeydakirin, ku ji bona kê durustkirinên kar divabûn bihatana bimaldarîkirîn. Berkirvanên teka tekan di rêzanê de tiştên xweyî xav ji bona berkirinê didatin bikaranîn, yên ku wî ew ligel çarên karên xwe û destkarîya xwe de yanjî bi karên kufletên mala xwe ve dirustkirin ji wan didatin biçêkirin. Ev durustkirinên hanê bi carekê di pêşî de sitendina wan ji bal wî de nedihate bidivakirin; jiber ku ew ji ber xwe ve bi malê wî ve dihatin biderkevtin. Maldarîkirina dursutkirinan weha li ser karê Xwedîyê xwe de dihate bibingehîkirin. Gerjî alîkarîya karê Biyanîyan jî bihata bidivakirin, li gora rêzanê de ew karê hanê bi sivik ve dihate biderkevtin û Xwedî wî karî ji bil kirya karê xwe hin ji tiştên din jî de ji xwe re didatin biwergirtin. Şagirt û Berdestê Hoste wan nebes tenê ji bona xwarin, vexwarinê û kirê li nik wan de didatin bikarkirin, lêbelê hêjîbêtir wan ji bona fêrbûna didatin bikarkirin, da ku belkî jî ew bi Hoste ve bêtin bikin. Di wê çaxê de çarên berkirinê di nava cihên îşê mezin û kargehan de hate bidestpêkirin, gava ku ew ji bona çarên berkirina civakîyî bi rastî ve hatin biveguhertin. Lêbelê ligel çarên berkirina civakî û berkirinê de wetov dihatin bireftarîkirin, mîna ku ew hêjî nala berê bi çarên

berkirin û berkirina teka tekan ve dihatin biderkevtin. Di berê de Xwedîyê çarên kar ji xwe berkirin didatin bisitendin; jiber ku ew di rêzanê de bi berkirina wî ve bi xwe ve dihatin biderkevtin û yarmetîya karê biyanî jê re bi tiştêkî ji rê derkevtî ve dihate biderkevtin, bi vî corê hanê jî ve niha Xwedîyên çarên kar hêjî wetov têtin biçûyîn, ku ew ji bona xwe berkirinê didin bihilanîn, tevîjî ku ew berkirinên hanê jî nema êtir bêtir bi yên wan ve têtin biderkevtin; lêbelê ew bes û bi tenha ve bi berkirinên karê Biyanîyan ve tête biderkevtin. Wehajî di niha de durustkirinên berkirinên civakî nema ji bal wan kesan de têtin bisitendin, ji yên ku wan çarên berkirinê bi rastî ve ji bona livandinê dabûn bixistin û bi rastî jî ve berkirin dabûn bidurustkirin; lêbelê ew berkirinên hanê ji bal Sermîyadaran de têtin bisitendin. Çarên berkirinê û berkirin di cewherên xwe de bi civakî ve hatine bikirin. Lêbelê ew ji bona jêr regekî sitendinê dihatin biavêtin, yê ku xwedîbûna taybetîyî berkirina teka tekan jêre dihatin bimerckirin, ya ku têde weha her yekekî berkirina ji xwe re didate bimaldarîkirin û wî ew ji bona nava bazarê didate bianîn. Şeweyê berkirinê dê ji bona jêrî vî rengê sitendinê bête biavêtin, tevî ku jî şewê berkirinê mercên hebûna vî rengê sitendinê dabûn biherifandin⁵⁰. Di

⁵⁰Li vir de bi pîwistî ve nayête biderkevtin, ku em li ser de bidin biaxivtin, ku heger rengê sitendinê jî bi mîna xwe ve bête bihiştin, dê rûçikên sitendinê di rêya bikêrkirinên li jor de axivtî de ne bi kêmî ve bi şûreşkirî ve ji berkirinê dê bêtin biderkevtin. Heger ku ez ji xwe re berkirina xwe yanjî berkirineke din bidim bisitendin, evaya bi serûştî ve bi du rengên pir cudan ve ji rengên sitendinê têtin biderkevtin. Di bere jî de: Karê bi kirê ve bi gelekî ve bi kevtin ve tête biderkevtin, yê ku têde tevaya şeweyê berkirina sermîyandariyê hêjî di katbûna xwe de tête biderkevtin, yê ku ew bi tenha xwe ve û ji hev belawelakirî bi dirêjîya sedsalan ve li tenîştî koletîyê de dihate biçûyîn. Ji bona şeweyê berkirina sermîyandariyê van katên hanê nikarîbûn xwe bidana bigeşkirin, lêbelê

vê dijbûna hanê, ya ku ew şêweyê berkirina nuh bi rûçikê wêyî sermîyandarîyê ve dide bixelatkirin, tevaya libingu-hêhevkevtina di dema niha de di katbûna xwe de tête bidîtin. Çiqasî bêtir şêweyê berkirina nuh di tevaya berên giringî berkirinê de û di tevaya welatên abûrfîyî giring de dihatin biserdarîkirin û pêrejî ji bona berkirina teka tekan tanî cihekî bigir pûç pê dihate bipalpêdan, hevqasî jî divabû bi eşkerejî ve lihevnekirina di navbera berkirina civakî û sitendina sermîyandarî de bihata biderkevtin.

Sermîyandarên pêşî li ber xwe de hebûna rengê karê bi kirê ve datin bidîtin, weke ku hatîye bigotin. Lêbelê karê bi kirê ve bi nala ji rê derkevtî, bi nala îşê di bere ve, bi nala karê katî ve dihate biderkevtin. Kargerê di çandinîyê de û kargerên ji xwe re carcaran bi rojan ve didatin bikarkirin, ew bi Xwedan çend latên erdên xwe ve dihatin biderkevtin, ji yên ku wan ji wan latên xwe di demên tengavîyê de dikarîbûn bihatana bijîyandin. Die Zunftordnung - Sazmendîya Destkarîyê- weha hatibû birêxistin, ku Şagirtê îro ji bona Hosteyê sibeynê divabû bihate biguhertin. Lêbelê gava ku çarên berkirinê ji bona çarên civakî hatin biveguhertin û ew di nava destên Sermîyandaran de hatin bikomkirin, ev tev hate biguhertin. Çarên berkirinê û herwehaji berkirina Durustvanên tekeyî biçûk bêtir û bêtir bi bê hêjabûn ve dihatin biderkevtin; li pêşîya wan de hîç tiştekî din nema dihate bidîtin, ji bil ku ew ji bona nik Sermîyadaran bi nala Kargerên kirê ve bêtin biçûyîn. Karê bi kirê ve, yê ku ew di berê de bi nala jirêderkevtî û alîkarîyê ve dihate biderkevtin, niha bi nala rêzanê ve û bi nala rengê bingehî ve ji bona tevaya berkirinê ve dihate biderkevtin; di

piştî durustkirina mercên mêjûyî ew hatin bigeşkirin.

berê de ew bi nala karê di bere de dihate biderkevtin, ew niha bes û bi tenha xwe ve bi karê Kargeran ve dihate biderkevtin. Kargerê bi kirêy car caran ve xwe ji bona Kargerên bi kirêyî hergavî ve date biveguhertin. Koma Kargerên bi kirê ve di tevaya jîna xwe de bi pir gewrebûn ve dihatin bipirkirin, li gor ku pêrejî di wê demê de rêstika derbegîyê dihate biherifandin, Peyetî ji hev dihate bikevtin û herwehajî pêrejî derkirina çotkaran ji nava zefiyên dihate biderkevtin ûhd.. Parkirina bi tevayî ve di navbera çarên berkirinê de hatibû bikişandin, ji yên ku ew li vê derê di nava destên Sermîyandaran de hatibûn bikomkirin û li dera hanê di nava destên Nedarên Berkirvan de tu tişt ne dihatin bidîtin, ji bil ku ew bes û bi tenha ve bi xwedanê hêza karê xwe ve dihatin biderkevtin. Dijbûn di navbera berkirina civakî û sitendina sermîyandarîyê de ji ser tiradê de bi nala dujminatîyê ve di navbera Pirolitarya û Borciwazîyê tete biderkevtin.

Me dît, ku şeweyê berkirina sermîyandarîyê xwe ji bona nava civakê ji berkirvanên mal û Durustvanên teka tekan xwe date bikişandin, ev jî di rêya veguhertina berkirinên wan bi hev re hate bikirin. Lêbelê di her çivakekê de, ya ku ew li ser berkirina mal bi xwe ve hatiye bibingehkirin, tede Berkirvanan serdarî li ser pêwendîyên xweyî civakî de dane biwindakirin. Her yek ji xwe re bi çarên berkirina xweyî lihevraştatî de û ji bona bi hevguhertina xweyî niyazmendîyî taybetî ve dide biberkirin. Kesek nizane, çiqas ji malên wî dê ji bona ser bazarê bêtin bihatin, çiqas jî jê bi irastî ve dê bêtin bifirotin, Kesek nizane, magelo dê berkirina wînayî tekane bi rastî ve niyazmendîyekê ji xwe re bide bidîtin, magelo dê ew xwerckirinên xwe bide biderxistin yanjî magelo dê ew bi rastî ve bikaribe bide bifirotin. Bê ser û berî di nava

berkirina civakî de tête bizalkirin. Lêbelê berkirina mal mîna her rengê berkirinêyî din qanûnên wêyî taybetyî pê ve girêdayî têtin bidîtin û ev qanûnên hanê xwe tevî vê bê ser û binîyê jî têde didin bicîanîn. Ew xwe di rengê tekanî û hêjî mayîna pêwendîyên bi hevreyî civakî de didin bidiyarkirin, ew xwe di bihevguhertinê de didin biderxistin û herwehaji ew xwe beramberî Durustvanên tekane ve bi nala qanûnên zordarîya berberyê ve didin bicihanîn. Ew qanûnên hanê ji bona van Durustvanên hanê jî weha di destpêkirinê jî de nayêtin binaskirin û ew divên di rêya serpêhatîyeke dirêj de hin bi hin ve ji bal wan de bêtin bidozandin. Belê ew qanûnên hanê xwe bi bêyî Durustvanan ve û bi dijî Durustvanan ve bi nala qanûnên serûştîyî korî bi kêr ve di rengê berkirina xwe de didin bicîanîn. Berkirin li ser Durustvanan de tête bizalkirin.

Di civaka sedsalên navînî de nemaze di sedsalên pêşî de berkirin di cewhera xwe de xwe li ser têrkirina ji bona xwe de dihate biberbûn. Wê bi pîrbûn ve niyazmendîyên Durustvanan û Kufletên malên wan de didate bitêrkirin. Mîna ku ew di nava gundan de dihate bidîtin û ku têde pêwendîyên peyetîyê ligel Derbegan jî de dihate bidîtin, wê pêrejî ji bona têrkirina niyazmendîyên Derbegan jî didate bihilgirtin. Jiber vê yeka hanê jî ve weha tu bihevguhertin nedihate bidîtin, jiber vê bi xwe jî ve berkirinan tu rûçikên mal ji xwe re nedane biwergirtin. Mala Cotkar bigir hemû ji xwe re didate bidurstkirin, ji hemû tiştên ku ew ji wan re ji firaxan, cil û bergan û herwehaji ji qûtê xwe jî dihatin bipêwistîkirin. Di gava ku ew bi wir ve hatin bigihandin, ku ew bêtirbûnekê ji niyazmendîyên xwe û ji ser deynên xweyî ser bi ser ve ji bal Derbegan de bidin bidurustkirin, di wê çaxê de wehaji wan Waren -mal- didatin bidurustkirin; ev bêtirbûna hanê ji bona bihevguhertina

civakî hate biavêtin û ew ji bona firotinê hatin bidakevtin, ew bi nala mal ve dihatin biderkevtin. Destkarên bajaran di destpêkirinê ji pêşîya pêşî de divabûn ji bona bihevguhertinê bidin bidurustkirin. Lêbelê wan jî perçeyên mezin ji niyazmendiyên xwe ji bona bi karên xwe ve ji xwe re didatin bikirin. Ew bi xwedan bax û zevîyên biçûk ve dihatin biderkevtin; wan terşên xwe ji bona nava daristana melbendê didatin binardin, ya ku wê ji bona wan text, dar û êzing didate bipêşkeşkirin, Pîrekan ji xwe re kitan, hirî ûhd. didatin birêstin. Berkirin ji bona armanca bihevguhertinê, ji bona berkirina mal hêjî di pêşîya katbûna xwe de dihate biderkevtin. Jîbervêjî ve bihevguhertineke sînorkirin, bazareke sînorkirî, şeweyê berkirineke di cihê xwe, cihê dûrkişî ji bal derve de û cihê bi yekirî ve di nava hundurê xwe de dihatin biderkevtin. Wetov Mark -herem- di nava gundan de û Zunft -girêdana kardestîyê- di nava bajaran de dihatin biderkevtin.

Di gewrekirina berkirina mal de û nemaze bi dakevtina şeweyê berkirina sermîyandarîyê ve qanûnên berkirina mal bi eşkere ve û pir bi hiner ve xwe didatin bikêrkirin, yê ku ew tanî wêçaxê jî bi paldayî ve dihatin biderkevtin. Hevbestîyên kevnî bi hev re hatin bisistkirin, sînorên berkirinên kevtin hatin bişikenandin, Durustvan bêtir û bêtir bi Durustvanên malî azad û teka tekan ve dihatin biguhertin. Serberdayîbûn di perkirina civakî de roj bi roj ve ji bona ser qadê dihatin bidakevtin û ew bêtir û bêtir bi tûjtir û bi notir ve dihate biderkevtin. Lêbelê tiştê bingehî, yê ku pê şeweyê berkirina sermîyandarîyê ve serberdayîna hanê di berkirina civakî de tête biberzkirin, bi xwe ve bi dijî serberdayînê ve dihate biderkevtin: Ew jî di berzkirina rêxistina berkirin de bi nala berkirina civakî ve di her wargehekî karkirinêyî tekane de dihate biderkevtin. Bi

vê hildana hanê ve şêweyê berkirina sermîyandarîyê himkirina kevnî aramî date bidawîkirin. Di kîjan berê çêkirinê de ew dihate bicîhatin, wê li teniştê xwe de tu rêyên kevtin di kargehê de nedihîştin bêtin bidîtin. Wê li kû derê de destkarî bi jêr destên xwe ve didatin bixistin, wê ew destkarîyên kevnî hanê didatin binemankirin. Warê kar bi gorepana şer ve dihate bikirin. Dozandinên giyografîyên gewreyî mezin⁵¹ û li dû wan de avedanîkirinan cihên bazaran datin bipirkirin û wan veguhertinên Handwerk - Hostan- ji bona Manufaktur -destkargehan- datin bilizkirin. Lêbelê ne bes tenê pevçûn di navbera Durustvanên cihîyî teka tekan de dihatin bivêkevtin; pevçûnên cihî ji aliyê xwe de ji bona pevçûnên nav miletan de û ji bona cengên bazirganîyên⁵² sedsalên Heftdehan û heştdehan de hatin bigewrekin. Di dawîya dawî de çêkirina gewre û durustkirina bazara cîhanî pevçûn dane bicîhanîkirin û pêrejî

⁵¹Ji giringtirîn dozandinên Giyografî dozandina Kiristov Kolombos ji bona Emerîka der sala 1492 de û dozandina Vasko de Famayê Portugali ji bona rêya deryayî ji bona Hindistanê der sala 1498 de têtin biderkevtin.

